Kurdisch

Mebesta we ji 3G, 2G û 2G plus çi ye?

- **3G:** kesên ku ji Corona sax bûne, bi tevahî vaksînkirî ne an jî kesên hatibin test kirin mafê têketinê hene
- **2G:** kesên ku ji Corona sax bûne, bi tevahî vaksînkirî ne mafê têketinê hene
- **2G plus:** kesên ku ji Corona sax bûne, an bi tevahî vaksînkirî ne mafê têketinê hene heke tevî van jî hatibin test kirin.

3G li cihên kar û veguhestina gîştî derbas dibe: di veguheztina gîştî de, pêdivî ye ku meriv maskên neştergerî an FFP li xwe bike Ev rêzikname ji bo tevgera hewayî jî derbas dibe.

2G ji bo cihen firotanê, çand û dema vala derbas dibe (mînak xwaringeh, bar, otêl, şano): Dikanên ji bo pêdiviyên rojane (mînak supermarket, dermanxane, dermanfiroş, pirtûkfiroş) ji her kesî re vekirî dimînin. Ger li navçeyekê bûyerek enfeksiyonê ya zêde hebe, dibe ku hikûmeta wîlayetê xwaringehan bigire an cîhê otêlê sînordar bike.

Tetstên rêkûpêk ên Koronayê: Testên bilez, mijareke girîng e ku têkiliyên asayî û ewleh zêdetir pêkan dike. Hemî kes li Almanyayê dikarin herî kêm carekê di hefteyê da, testeke bilez a bêpere pêk bînîn.

Dibistan: Ji bo hemî astên polê pêdivîyek maskek heye.

Rêzikên din: Hiûmeta wîlayetê rêzikên xwe ji bo qadên wekî kuafor an studyoyên fitnessê derdixin.

Sînordarkirinên Têkiliyê: Civînên taybet ên ku tê de kesên ku vaksîn negirtine an sax nebûne beşdar dibin, tenê ji bo malbata wan û herî zêde du kes ji malbatek din têne sînordar kirin. Ev yek ji bo zarokên heta 14 salî derbas nabe.

TIŞTÊ KU PÊWÎST E DERBARÊ KORONAYÊ BIZANÎ (integrationsbeauftragte.de)